# Tempus - sîstema nû ya bo hemî pêşdibistan û Fritids’ê (navendên dema vala)

Di 29’ê Gulanê de, hemî pêşdibistan û Fritids bo belavkirina şemaya bernameyan, raporkirina nehatinan û raporkirina şemaya betlaneyê sîstemeke nû datîne. Navê vê sîstema nû Tempus e. Ji 29’ê Gulanê ve, hûn wek welî dikarin têkevin Tempus’ê. Hûn dikarin vê yekê bi riya web’ê (tevnê), ap’ê û bi e-legitimation’ê bikin.

## Hûn vê yekê li Tempus’ê dikin

Ya ku hûn dikarin li Tempus bikin ev e:

- Şemaya zarokê xwe binivîse
- Ji bo zarokê xwe roja betlaneyê qeyd bike
- Nehatina zaroka xwe li vir ragihîn (li Unikumê jî ev dikare bê kirin)
- Diyar bike ka kî wê zarokê we ji vir bigire
- Agahiyên xwe yên pêwendiyê binivîse
- Peyamên bîrxistinê werbigire

## Tempus wekî xizmeta malperê û ap’ekê heye

Tempus wekî xizmeta malperê û ap’ekê heye Hûn dikarin heman tiştan ku hûn li ser ap’ê dikin, li ser malperê jî bikin.

Hûn dikarin bi riya Lärknuten xwe bigehînin [larknuten.se](larknuten.se). Li ser tiştê ku hûn dixwazin bikin bitkînin, nimûne "Şema bar bikin". Paşê hûn ê bi otomatîkî têkevin Tempusê.

Navê ap’ê Tempus Hemma ye. Ew ji bo daxistinê li vir heye: App Store û Google Play.

## Hûn bi e-legitimation’ê dikevin nav Tempus’ê

Hûn bi e-legitimation’ê, wek BankID, dikevin nav malperê û ap’ê. Heger ji ber hin sedeman hûn nikaribin e-legitimation’ê bi dest bixin, bi beşê Support’ê yê Lärknuten’ê re têkilî daynin larknuten@katrineholm.se. Ji 29’ê Gulanê ve, hûn dikarin têkevin Tempus’ê. Hem di ap’ê de û hem jî di malperê de.

## Agahiyên bêhtir li ser katrineholm.se hene

Hûn dikarin li ser katrineholm.se/tempus bêhtir agahdarî derbareyê guhertina karê Tempus’ê bibînin:katrineholm.se/tempus. Li vir hûn ê pirs û bersivên hevpar bibînin, lê di heman demê de vîdeoyên derbareyê mirov çawa Tempus’ê bi kar tîne jî bibînin.

## Personel û Kontaktcenter (Navenda Têkiliyê) dê alîkariya we bikin

Heger pirsên we li ser Tempus’ê hebin, an jî hewcedariya we bi alîkariyê hebe, hûn dikarin bi xebatkarên pêşdibistanê re yan jî bi Fritids’ê re biaxivin. Her weha hûn dikarin biçin Kontaktcenter’ê ya li Djulögatan 31B. Kontaktcenter rojên hefteyê, ji bilî dawiya hefteyê, ji saet 10.00 heta 16.00 vekirî ye.